Jîn

Jimara heştê | Heyva Kanuna Êkê 2006 | Vercinye, Emrîke | perê - 2

# Azadîa rastî çi ye?

Rast e "azadîa rastî" çi ye? Heker me zanî ba dê me jîana her u her hebit, belê ew dê azadîa rastî bit!

Belê mebesta rast ya Krismesî derbarê dîarîya ye. Jîana her u her dîarîyek e ji destê Xwidê têt. Bila em seḧkînê dîarîyêt Xwidê u em ji bîr ne kîn.

## Dîarî

**Dîarîya êkê – jîan.** Xwidê jîan daî me – Xwidê em çêkirîn. U çawa lê hat? Li destpêkê Xwidê bi Peyvê xu axift (ferman da) u cîhan çêkir.

**Dîarîya dûê – pêẍember.** Xwidê zelam wek Musa u Îbrahîm dan vî şulî: peyvê Xwidê bidin miruva da pîa Xwidê bikin u bijîn.

**Dîarîya sîê – 'Îsa.** Çunku Xwidê ḧe ji me dikit, dîarîyekê gelek mezin daî me. Xwidê 'Îsa bu me hinart! Tijî sala ji berî Xwidê 'Îsa Pêẍember hinarte cîhanê, deykbîna wî hat pêẍemberatî kirin.

'Îsa taybet e u me çi car wek pêẍemberek dî ne dîtî ye. Ew dîarîe ji Xwidê **bu ḧemî cîhanê ye**, ne bi tinê bu êk milletê.

(1) Deyka 'Îsaî kiça kiçîn bî.

(2) Cihê deykbîna 'Îsaî pêẍemberatî bi rê ve bir u Xwidê li bajêrê Beytleḧim (bajêrê Daûd Paşayî) da.

(3) Tijî frîşteyêt Xwidê deykbîna 'Îsaî ragehand: gut deyka wî u mêrê wê u hindek şivana.

(4) Stêra 'Îsaî hindek stêrnas ji rojhelatê înan mala wî da wan şîan 'îbadeta wî bikin. (Çîrokê li perê sîê li vê guvarê bixwîne.)

U buçî 'Îsa bî miruvek u hat li gel me? Da me azad bikit u da me dê runahîya rast hebit.

> "Gîanê Xudanê rêzdar li ser min bit, çunku Xudanî ez çewir kirim, da mizgînîê bidime belingaza, ez hinartim da brînêt dil şikestîya bigirêdim, da daxwaza berdana zîndanîa bikim u yêt jêrdest jî bi azadîê, da destura Xudanî ya wergirtî rabigehînim, u roja tol vekirnê bu Xudayê me, da xema dilê wan ez hilgirim." (pêẍemberatîa Eş'îyaî)

**Dîarîya çarê – jîana her u her.** Belê em u ew miruve Xwidê li destpêkê çêkirîn pîa Xwidê ne kirî ne u ji ber hindê ji Xwidê dîr kirî ne - bi gîanî mirin u dîmahîê bi leşî mirin. Belê Xwidê divêt miruv li gel wî bin (ye'nî sax) u ne vêt miruv jê dîrkirin (ye'nî mirî). Xwidê divêt em li gel wî her u her bijîn.

'Îsa jîan e! 'Îsa hat da ewêt ku bawerî bi navê wî înaîn, maf da wan bibine biçîkêt Xwidê. Bi rêka 'Îsaî Xwidê tarîya me dikite runahî.

Em ber çakîê Xwidê u bi bawerîê qurtal dibin u ne bi kirîarîêt xu. Heker em qebîl bikîn ew dîarîe ji Xwidê (yê 'Îsa) u bawerîê pê bînîn, belê dê bu me jîana her u her bit. U piştî leşêt me dimirin, em dê her u her li gel Xwidê mînîn.

U ewe azadîa rastî ye.